Bundesamt für
Fremdenwesen
und Asyl

Agahiyên li bara venêrîna hevbeş a daneyan

“Tomara navendî bo hemwelatiyên biyanî”

li gorî madeya 13 û 14 ya Rêzikên Gişti yên Parastina Daneyan (DSGVO)

Nav û Hûrgiliyên pêwendiyê yên kontrolkarî:

Bundesamt für Fremdenwesen und Asyl (Daîreya Federal a Koçberî û Penaberiyê)
Modecenterstraße 22, 1030 Wien
Tel: +43- 59 133 98 7004
Faks: +43- 59 133 98 7399
e-name: BFA-Einlaufstelle@bmi.gv.at

Hûrgiliyên pêwendiyê yên berpirsê parastina daneyan:

Tel: +43- 59 133 98 - 0
e-name: BFA-Datenschutzbeauftragter@bmi.gv.at

Armanca venêrîna bo daneyên ferdî bi vê mebestê ye:

Venêrîna hevbeş û bikaranîna daneyên ferdî ji aliyê Wezîrê Federal ê Hundir, Rayedarên nûner, Dadgeha Îdarî ya Federal, diyarbûyî li Peymana Cîwarbûna Demkî û Herdemî ya Biyaniyan, navendên parêzgehî yên polîs li tomara navendî bo armanca polîsê biyaniyan, rayedarên cîwarbûnê û penahxwaziyê ve pêk tê.

Bingeha qanûnî bo venêrînê:

Madeya 26, 27, 29 û 58 ya qanûna federal bo diyarkirina destûrên giştî têkildarî kiryarên li ber Daîreya Federal a Koçberî û Penaberiyê bo wergirtina rewşa parastina navneteweyî, destûra cîwarbûnê ji ber mercên awarte, paşvegerandin, paşavêtina jiholêrakirin û destûrdana karên dawîanîna cîwarbûnê û dayîna belgeyên Avûstryayî bo biyaniyan (Peymana Kiryaran BFA, BFA-VG) têkildarî Peymana Dewleta-E, û Destûra Diyarkirina çarçoveya Dewletê, Destûra Tomarê ya Kemilandinê, û Peymana Federal a Birina derve ya Kesan, Cihê kar, Avahî û Serjimêriya Apartimanê (Peymana Serjimêriya Tomarê).

Dirêjahiya dema ku agahiyên ferdî yê werin xwedîkirin:

Daneyên li gorî Peymana Kiryarên BFA hatine girtin her dereng dê bi awayê fîzîkî werin pakkirin
1. dema şexs hemwelatîbûna Avûstryayê wergirtibe û êdî ew dane bo derxistina belgeyeke dayî bo wan şexsan wekî biyanî pêwîst nebe;
2. dema Daîreya Federal a Koçberî û Penaberiyê yan Dadgeha Îdarî ya Federal ji mirina şexs agahdar bûne û 5 sal jî ji ser ra derbas bûbin, yan
3. deh salan piştî biryara dawîn a kiryarê li ber Daîreya Federal a Koçberî û Penaberiyê yan Dadgeha Îdarî ya Federal, yan piştî paşwergirtina daxwazekê, kutabûna daxwaza kiryara têkildar, yan dema ku êdî daxwaz bêbingeh e. Ev wê demê bi kar nayê ku qedexeya ketina hundir yan cîwarbûnê bo şexs bi kar tê. Eger itibara karê demkî yê kutakirina piştî xala diyarbûyî li mehkîmbûna yekem da vala bûbe, dane ji ber bêbingehbûna itibarê pak dibin.

Desteya kesên daneyên ferdî werdigirin:

1. Dezgehên ewlehiyê wekî ku li madeya 4 ya Peymana Polîsê Ewlehiyê de diyar bûye
2. Navendên parêzgehî yên polîs
3. Rayedarên diyarbûyî li Peymana Cîwarbûna Demkî û Herdemî ya Biyaniyan
4. Rayedarên nûnerên Avûstryayê li derve
5. Daîreya Federal a Koçberî û Penaberiyê
6. Rayedarên Dadweriyê
7. Rayedarên malî yên cinayî
8. Rayedarên diyarbûyî li gorî Peymana Karên Biyaniyan
9. Beşên Tomara Medenî
10. Rayedarên hemwelatîbûnê
11. Rayedarên tomara cîwarbûnê
12. Daîreya Komîsaryaya Bilind a NY bo Penaberan li Avûstryayê
13. Rawêjkarên qanûnî li gorî madeya 49-52 ya Peymana Kiryaran BFA
14. Aliyên lihevkirinê yên peymanekê bo diyarkirina dewletê rayedarên têkildar ên dewletê yên dewleta ku biryar e rêzikên Dublin‘ê pêk bînin, rêzikên ku bo lênêrîna daxwaza penaberiyê yan daxwaza parastina navneteweyî xwedan şiyan e.
15. Rayedarên biyanî yên berpirsên pêkanîna Konvansiyona Jênêvê bo Penaberan in, dema diyarkirina pênaseyê herwiha dayîna penaberiyê bêyî bo van rayedaran pêkan û mimkin nîne û dikare pêbawer be ku ev dane nakevin destên rayedarên wan welatan ku penahxwaz jê tên yan ditirse ku lê were girtin
16. Rayedarên rifaha ciwanan
17. Lijneyên federal û parêzgehî yên karên têkildarî pêkanîna Lihevkirina Muqate û Xizmetên Bingehîn dikin
18. Xizmetên Gişтî yên Karpeydakirinê yên Avûstryayê (AMS) û rayedarên xwecih û erkdar ên naveroka muqatebûnê û arîkariya têkelbûnê
19. dezgehên navçeyî yîn tenduristiyê û Federasiyona Avûstryayê bo Dezgehên Sîgorteya Civakî
20. Dadgeha Îdarî ya parêzgehên federal
21. Dadgehên medenî û cinayî herwiha zîndan
22. Wezareta Fedral a Ewrûpayê, Karên Têkelbûnê û Derve
23. Rayedarên welatê jêder

24. Rayedarên Tomarkirinê yên ÇavkaniyaPIN li gorî pîvanên diyarbûyî li Peymana Dewleta-E

25. Amara Avûstryayê

26. Xalên neteweyî yên pêwendiya rayedarên din ên cîwarbûnê li welatên endamên YE bi rêya Wezîrê Federal ê Hundir

27. Dezgehên ewlehiyê li hemû welatên dinyayê

28. Dezgehên ewlehiyê yên navneteweyî

29. Dadgeha Îdarî ya Federal

30. Welatên endamên YE

31. Wezîrê Federal ê Hundir

32. Şêwirmendên vegerînê

Venêrînerên ku li madeya 4, mijara 8 ya DSGVO diyar bûne, bi rêz madeya 36, beşa 2, mijara 9 ya Peymana Parastina Daneyan (DSG)): IBM Österreich - Internationale Büromaschinen Gesellschaft m.b.H., Microsoft Österreich GmbH, Bundesrenchenzentrum GmbH, Atos IT Solutions and Services GmbH

Mafên mijara daneyan:

Heqê gilîkirinê:

Heqê gilîkirinê li Rayedarên Parastina Daneyan a Avûstryayê (1030 Wien, Barichgasse 40-42, tel +43 1 52 152-0, e-name dsb@dsb.gv.at) li gorî madeya 24, benda 1 ya Peymana Parastina Daneyan bi kar tê (DSG).

Heqê dest gihîştinê, heqê sererastkirin an pakkirina daneyên ferdî:

Heqê dest gihîştinê li madeya 15 ya DSGVO diyar bûye.

Heqê sererastkirinê li madeya 16 ya DSGVO diyar bûye.

Heqê pakkirinê (‘heqê jibîrbûnê’) li madeya 17 ya DSGVO diyar bûye.